Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Sibat / 1 - 2 - 2022

Kurdistan-Hejmar (214)

www.pdk-s.com

# "Zarokên xelkê vegerînin, pabendî rêkeftinên navdewletî bibin"

Kurdistan **Salar Omer**



**Di dema şer û aloziyên zindana Hesekê li Kurdistana Sûriyê, Ciwanên Şoreşger ku rêxistineke ser bi PKK ve ye, hejmareke zarok ji bajarê Hesekê û derdora wê revandine, heta niha çarenivîsa wan nediyar e, hin ji malbatan navên zarokên xwe belav kirine, lê beşekî din hêj li benda vegera wan in, ji ber vê yekê navên wan belav nakin, û hin ji wan malbatan jî rastî gefan tên dema pirsa zarokên xwe yên revandî dikin. Welatiyek ku merivekî wî hatiye revandin ji Rojnameya Kurdistanê re got, gelek zarok di vê dema dawî de ji aliyê ciwanên ser bi PKK ve hatine revandin, û vê rêxistinê sûd ji pirsa zindana Xwêran wergirtiye û bi serê zarokan lîstine da ku wan tevlî karên serbazî bikin.Welatiyek dibêje, ev rêxistin û ne jî HSD pabendî rêkeftine derbarê zarokan nabin, û binpê dikin.**

# Kî di ber bûyera zindana girtiyên DAIŞê li Hesekê berpirs e



Kurdistan-
Îmad Elo

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) li ser rewşa zindana Xiwêran daxuyaniyek belav kir û ji Hevpeymaniya Navdewletî daxwaz kir; çareseriyek derbarê wan bi hezaran girtiyên DAIŞê de bibînin. ENKS di daxuyaniya xwe de ji Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAIŞê daxwaz dike ku berpirsyariya xwe li ser parastina navçeyê û piştevanîkirina aramiyê bi rêya îdareyeke hevbeş bigre ser xwe, ku hemû pêkhate tê de beşdar bibin.
Herwiha daxwaz kir ku çareseriyek derbarê bi hezaran girtiyên DAIŞê de bibînin, ku niha li navçeyê ne û hikûmetên welatan werin neçarkirin ku welatiyên xwe werbigrin û dadgehî bikin.
ENKS ji Fermandariya Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) jî daxwaz dike ku dawî li binpêkirinên PYDê bîne, ku bi navên cuda cuda ve azadî û karê siyasî û yekhelwestiya Kurdan dikin armanc. Şeva 20-2022-1 çekdarên DAIŞê êrîş kirin ser Girtîgeha Xiwêran, ku ji aliyê HSD ve li bajarê Hesekê tê birêvebirin. Fermandarê Hêza Erkên Hevbeş ên Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAIŞê radigihîne, divê hûrgilyên rewşa ku bûye sedem DAIŞ êrîşî Hesekê bike, bên naskirin. Fermandarê Hêza Erkên Hevbeş ên Hevpeymanan John Brennan li Twittera xwe nivîsî û ragihand, “Hevpeymanî li aliyê hevpeymana me HSDê ya bi wêrekî li Hesekê şer kiriye radiwest e.” Brennan Tekez kir: “Ev pirsgirêk ne tenê di hundirê Hesekê de bû, lê belê ev pirsgirêkeke navdewletî ye û divê hemû dewlet di vê derbarê de alîkar bin.”Wî fermandarê Hevpeymaniya Navdewletî hişyarî da û got: “Ev zîndanên demkî yên li seranserî Sûriyê, zemîneke guncaw e ji bo belavbûna hizra DAIŞê.”Da zanîn jî: “Hîn gelek kar maye li Hesekê bê kirin û em pabend in bi pêşkêşkirina şêwir û alîkariyê, ji bo hevpeymanên me yên li Iraq û Sûriyê bi ser bikevin.”
Fermandarê Hêza Erkên Hevbeş ên Hevpeymaniya Navdewletî tekez kir jî, “Hîn DAIŞ li herêmê gef e û nabe rê jê re were dayîn da ku careke din vegere.”.
Wezareta Derve ya Rûsyayê dibêje; bûyerên van demên dawî yên li Hesekê şikesta Amerîka û HSDê di parastina asayîşê de, nîşan dide.
Li gor Wezareta Derve ya Rûsyayê, aloziyên ewlehiyê yên van demên dawî, ku li bajarê Hesekê rûdan, derxistiye holê ku Amerîka û hêzên desthilatdar ên Kurd di parastina asayîşa wê deverê de bi ser neketine. Cîgirê Rêveberê Ragihandin û Rojnamevanî yê li Wezareta Derve ya Rûsyayê Aleksey Zaytsev di daxuyaniyeke çapameniyê de li ser êrîşa çekdarên DAIŞê ya li Girtîgeha Xiwêran a li bajarê Hesekê got: “Zelal û eşkere ye, Amerîka û desthilatdarên Kurd ên xwecihî, di parastina asayîşa navçeyên bakurê rojhilatê Sûriyê de ku di bin kontrola wan de ne, bê şiyan in.”
Parêzerk ji rojnameya Kurdistan re ragiahnd, çawa bi vê hejmara zêde ya parêzvanên zindanê û çend çekdarên DAIŞê karîne derbasî nava zindanê bibin, û şer bikin, pirs ew e gelo çekên di destê DAIŞê de bûn ku çekên pêşketîbûn kete destê wan de, gelo çima HSD di destpêka bûyerên de behsa çekdarên revyayî nedikir û piştre got wan hejmareke çekdar girtine û hin ji wan çekdaran jî xwe radestkirine, divê ev buyer bi zelalî ji raya giştî re were eşkerekirin, ji ber xwîna van xortan hemû bê sêd bê mifa çû.
Welatiyek dibêje, di bûyera zindana Hesekê de destê beşek ji hêzên HSD di nav de hebû, û ev yek hatiye kirin heta ku HSD kêmaniyên xwe li deverê veşêre û careke din navê xwe bilind bike û ya rast jî ev e, da ku xelk behsa jiyana rojane û pirsên abûrî neke. Xelk ji van şanogeriyan bêzar bûne.





# Pêşmerge stûna rizgarkirina Kobanê bû

Kurdistan-
Mihemed Ehmed

Serok Mesûd Barzanî bi boneya salvegera rizgarkirina bajarê Kobanê yê Kurdistana Sûriyê peyameke pîrozbahiyê belav kir. Li ser hesabê medyaya civakî ya ofîsa Serok Barzanî bi boneya salvegera rizgarkirina bajarê Kobanê yê Kurdistana Sûriyê peyameke pîrozbahiyê hat belavkirin û di peyamê de hat diyarkirin: “7emîn salvegera rizgarkirina Kobanê pîroz be.” Bajarê Kobanê yê Kurdistana Sûriyê di sala 2014an de ji aliyê rêxistina DAIŞê ve hatibû dagirkirin. Bi fermana Serok Mesûd Barzanî, Parlamentoya Kurdistanê biryarek derxist û hêzên Pêşmerge derbasî bajarê Kobanê bûn û ligel hêzên li wir li dijî DAIŞê şer kirin. Hêzên Pêşmerge di roja 29ê Cotmeha 2014an de di deriyê sînorî yê Xabûrê re derbas bûn û bi rêya Bakurê Kurdistanê derbasî Kobanê bûn. Wê demê ji sedî 70 bajarê Kobanî ji aliyê DAIŞê ve hatibû dagirkirin, piştî ku Pêşmerge derbasî nav bajêr bû, bi piştevaniya esmanî ya Hevpeymaniya Navdewletî jî, hêzên xwecihî di roja 26ê Çileya 2015an de bajêr ji DAIŞê paqij kir. Di Îlona 2014an de DAIŞê bi tevahiya karînên xwe êrîşî ser herêma Kobanê kir, lê Pêşmergeyên Kurdistanê û hêzên xwecihî û bi alîkariya Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAIŞê, karîn roja 26ê Çileya 2015an dorpêça li ser bajêr bişikînin û DAIŞê ji tevahiya herêmê dûr bixin. Rizgarkirina Kobanê:Beriya 7 salan, bajarê Kobanê yê Kurdistana Sûriyê ji aliyê hêzên xwecihî û bi alîkariya hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê hate azad kirin. Di Îlona 2014an de çekdarên DAIŞê bi çekên giran êrêşî ser Kobanê kirin. Di destpêka de, DAIŞê 350 gundên derdora Kobanê kontrol bikin ku di encamê de nêzîkî 400 hezar kes derbeder bûn û berên xwe dan bajarên Bakurê Kurdistanê. Êrîşên DAIŞê roj bi roj zêdetir dibûn û rûbera kontrola wan jî berfireh dibû û hewl didan xwe bighînin navenda bajarê Kobanê. Ji ber nebûna karînên hêzên xwecihî di wê demê de û zêdebûna metirsiya rêxistina DAIŞê li ser bajarên Kurdistana Sûriyê, Serok Mesûd Barzanî biryara piştevaniya Kobanê da û li ser fermana wî jî çek û hêz ji bo Kobanê hate şandin û hêzên Pêşmerge ji Herêma Kurdistanê derbasî Bakurê Kurdistanê û bû û ji wir ve jî derbasî Kobanî bûn û alîkarioya hêzên xwecihî kirin. Li Kobanê û di şerê li dijî DAIŞê de, hêzên Hevpeymaniya Navdewletî jî alîkariya Hêzên xwecihî kir. Herweha beşek ji hêzên bi ser artêşa azad a Sûriyê ve jî şer li dijî DAIŞê kirin. Ji ber tundiya lêdanên li ser DAIŞê, dorpêça li ser Kobanê hat şikandin û di 26 li ser 27 Çileya 2015an de, hêzên Pêşmerge û hêzên xwecihî karîn bajarê Kobanê û hejmareke mezin ji gundên derdora wê ji destê DAIŞ bi temamî derxin û serkeftina xwe ragihandin. Şerê Kobanê 134 rojan berdewam bû û ji ber tundiya şer jî, 70 ji sedî ji bajêr wêran bû û ziyanîn canî yên wî şerî jî gelek bûn ku Pêşmergeyek û zêdeyî 100 şervanên xwecihî şehîd bûn.Welatiyekî bajarê Kobanê dibêje, heger Pêşmerge û serok Barzanî neba dê baca rizgarkirina Kobanê gelekî giran ba, biryara serok Barzanî ya şandina Pêşmerge ji bo Kobanê dîrokî bûye, û divê rêzê lê bê girtin.





# Îdrîs Barzanî endezyarê aştiyê



Kurdistan

35 sal di ser koça dawiyê ya endezyarê aştiyê Îdrîs Barzanî re derbas dibin. Dema rûpelên dîrokê tên vekirin û behsa kesê bi bandor û hêz di dîroka Kurdan de tê kirin, divê navê Îdrîs Barzanî di yek ji wan rûpelan de were dîtin. Heval û hevsengerên Îdrîs Barzanî wî bi endezyarê hewldanên yekrêziya gelê Kurd bi nav dikin. Îdrîs Barzanî di Adara 1944an de li navçeya Barzanî di hembêza malbatekê de ji dayik bû, ku çavkaniya dîroka Kurdistanê amaje pê tê kirin, "Ji destpêka sedsala 20emîn de bûbû mala mezin ya Kurdeyatiyê û sembola neteweyî û rûgeha têkoşerên Kurd." Îdrîs Barzanî temenê wî gihêşt du saliyê, bavê wî Mistefa Barzanî bi mebesta piştevaniyê li Komara Kurdistanê li Mehabadê berê xwe da Rojhilatê Kurdistanê. Di temenê 6 saliyê de Idrîs Barzanî li bajarê Kerbelayê bo yekem car çû ber xwendinê û heta rûxandina desthilata Padşahiyê li Iraqê û hatina Komariyê bi rêbertiya Ebdulkerîm Qasim di sala 1958an de, Îdrîs Barzanî bavê xwe nedît, lê di wê sale de Mistefa Barzanî û hevalên xwe ji Sovyêtê vegeriyan û piştî demeke dirêj ji dûrbûnê malbata wî pê şa bûn. Li gor nivîsên Partiya Demokrat a Kurdistanê, piştî vegera Mistefa Barzanî ji Sovyêtê û serîhildana şoreşa Îlonê di sala 1961an de, Îdrîs Barzanî ji Pêşmergeyên yekem bû ku pêwendî bi rêza şoreşê kir û çek hilgirt û mil bi milê Pêşmergeyan beşdarî di destanên serkeftinên şoreşê de kir. Îdrîs Barzanî di şoreşê de çendîn serkeftinên mezin tomar kirin, ku di destana Çiyayê Hindirîn de di meha Gulana 1966an de encam da û tê de hêza Pêşmerge karî li hember firqe û lîwayên artêşa Iraqê .Piştî 9 salan ji Pêşmergayetiyê û beşdarbûna di şoreşa Îlonê de, di meha Hizêrana 1970î de di kongreya 8emîn a Partiya Demokrata Kurdistanê de, bo yekem car Îdrîs Barzanî bû endamê Komîta Navendî ya Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK)
Îdrîs Barzanî di dîroka tevgera rizgarîxwaza netewî de bi endezyarê lihevhatina niştimanî hate binavkirin û di heman demê di neydana siyasî ya Iraqî de wek kesayetiyekî diyar û bi bandor tê hejmartin. Roja 31ê Çileya 1987ê, li gundê Sîlwana ya ser bi bajarê Urmiyê, Îdrîs Barzanî koça dawî kir û li goristana Şino li tenişt bavê xwe Mele Mistefa hate veşartin. Piştî raperîna 1991ê, li ser daxwaza serkirdetiya PDKê termê Mele Mistefa û Îdrîs Barzanî bo Başûrê Kurdistanê hatin veguhastin û li gundê Barzanê bi axê hatin spartin.
Serok Mesûd Barzanî di pirtûka "Barzanî û Tevgera Rizgarîxwaz a Kurd – Şoreşa Gulanê" de amaje bi Kak Idrîs Barzanî kiriye û diyar dike "Kak Idrîs mirovekî gewre bû û gewrebûna wî jî di têgihîştin û pêgehîştina wî bû û ev yek jî bûbû sedema nermbûna wî."
Serok Barzanî di pirtûka xwe de li ser Kak Idrîs nivîsiye: "Ew kesekî canfîda û bexşendekar bû û bîr li tolhilanînê nedikir. Wî gelek caran mirovên asayî û hejar wek endamên malbata xwe dizanî."
Barzanî di bîranîna Kak Idrîs Barzanî de behsa hesta hevkariya wî kiriye û got: "Vê yekê hiştiye ku Kak Idrîs cihê xwe di dilê gel û hemû kesan de çêkiriye û wî wekî alîgir û rizgarkarê xwe bizanin."
Serok Barzanî amaje bi wê jî kir, "tevî ku hemû ew hemû metirsî hebûn, gelek caran Kak Idrîs birîndar û Pêşmerge li mala xwe diparastin û ji bo dermankirina wan, ew li ser erkê xwe dişandin bexweşxaneyan."
Kak Îdrîs Barzanî di Adara 1944an de li navçeya Barzanî di hembêza malbatekê de ji dayik bû. Roja 31ê Çileya 1987ê, ji ber nexweşiya koça dawiyê kir û li gundê Sîlwana ya ser bi bajarê Urmiyê yê Rojhilatê Kurdistanê bi xakê hat spardin.
Piştî raperîna 1991ê û rizgarkirina beşeke mezin ji xaka Kurdistanê, di 6ê Cotmeha 1993an termê Rêberê Tevgera Netewî Mele Mistefa û serkirdeyê diyar ê tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê Îdrîs Barzanî, ji Rojhilatê Kurdistanê bo Başûrê Kurdistanê hatin veguhastin û li gundê Barzanê bi axê hatin spartin.

## Dayê

Emel Hesen

Dayê min berde
Ezê herim cengê
Xwîşek tu bîne
Wan Çek û rexta

Bi kinçên cengê
Min bixemlînin
Li bejna min kin
Şûr û mertalan

Desmala kalan
Ser eniya min kin
Tifinga Barzan
Li milê min kin

Bi navê rojhat
Ezê rê bigrim
Xatir bixwazim
Ji dayîk û bavan
Ji dost û hevalan

Pişta xwe bidim
Feleka bêbext
Berê xwe bidim
Şoreşa gelan

Ciyê rûmetê
Îro li nav Welat
Destê xwe bidim
Destê biratiyê

Da bibim Şervan
Leşkerê geran
Û Pêşmergê Barzan
Li ser Xaka Welat

Çeperên pêşiyê
Ezê cî bigrim
Sînga xwe bidim
Pêşiya gulan

Da em bişkînin
Qeyd û zincîran
Û serê Zahakê
Dijminê kevnar

Û xurt û koledar
Bi Xwîna zela
Ji nû ve avakin
Biharek azad .

